Sînor

Hêj, hemû votkayê vedixwin

Luqman Asîhî

Beriya du-sê rojekan dengê zengilê telefona min bilind bû. Dema min lê nêrî, min xwediyê nimrê nasnekir. Ango, nimre li ba min nû bû. Piştî rojbaşekê, ji min pirsî: Tu min nasdikî? Min bi (na)yê bersiva wî da.

Gote min: Ez kurê xalîtka te mele Mihemed im.

- ser çavan, xalê hêja.

Di hizara xwe de min bir û min anî: Sê xalîtkên min hene, her yekê çar-pênc kurên xwe hene, lê ta vê seatê jî ez pê nizanim ku min hinek xwarziyên mela hene.

- Xalê Loqman, tu kû ve çû yî?

- Bibûre hêj min, paşê tu ne naskirî!

Camêrî careka din xwe bi min da naskirin… Mele Hemdî!

Mele Hemdî!

Beriya ez bêjim ka çima telefona min kir, ez wê hindekê basê vî melayê enrîke bikim:

Dema em zaro, kesê ne dikarî li hember wî rabiweste. Li me tevan diêxist û gelek caran xwe di dê, bab û kalên me jî vedikir. Qute darik di destan de bû û paçikek sor li eniya xwe dişidand û zarokên weku wî diketine pey û dizî dikirin û yê li du şopa neçû serê wî dişkand.

Demekê winda bû. Çavê gundiyan ji wî û babê wî di pisaka hemû bi çi ser çû? Digot:wê li bajar ji xwe re kar dike. Paşê çand heyîvekan, careka din deng û dorên Hemo yî li gund belavbûn, ru diçû yî kû derê digotin: Weledê zinayê ye. Kitka heft rihe, mêrê jinkê dema dicihê jinka xwe re dîtî, neh gule li zikê wî dane. Lê nemiriye û niho li Bexdayê ye. Lê seba diziyan direve û vedigere gund û hogirên xwe li xwe kom dike û fêrî vexwarina votkayê dike. Yekem kes "meşrob" aniye gund mele Hemîd bû.

Ez dirêjnakim vî mirovî anku (kurê xalîtîka) min, çi nema nekir ta sê gule li birayê xwe yê mezin jî êxistin ku ji ber wî ji gund barkir.

Dema min jê pirsî: Ez wê çawa bikarim xizmeta te bikim? Got: Jinka min ya siyê çavekê wê kore bûye. Ez dixwazim tu pêre herî tirkî.

-Ser çavan xal! Ma te çend jin hene?

-Li dûv anîna Îslamê çarin, merge xalê.

Lê ta vê saetê jî ez nizanim bi çi awayî Hemo bû mele Hemîd!

Dibêjin ta îro jî seyda nanive ger cameka votkayê nevexwe.